HELBEST

Kulxana
Gundên jibîrkirî

-

TEMOZ ŞEMALÎ

Wêneyên matîv : Canê Efrînî
Kumbiyoter : Ciwan serfiraz
Wêneya qêb : Şengal cûmî
Lêveger : Bavê hêmen
Çapa yekemîn : Du hezar pênca
Mafê çapê : parastiye ji helbestvan re
Çapkirin : Çapxana Şawîşka(Libnan)

LI ŞÛNA PÊŞGOTINÊ

Ev bû çend carin em xwe di evê rikberiyê de dibînin; li gor dîtin û bîrweriyên xwe, em li dijî nivîsandina pêşgotinan e û vaye ev bû çend carin, em pêşgotina hin pirtûkan dinivîsin û xwe weke pişgir û hevpişk an jî, bi kêmanî, em bi xwediyên evan pirtûkan re, bepirsiyariya ewan berheman parvedikin; çi ji aliyê dîtin û helwestên ku, di riya mijar û helbestên xwe re dadixînin û çi jî ji aliyê nivîsandin û huneriya ewan berheman be.

Lê tevî evê rastiyê jî, em dixwezin evê xalê hinekî ronî bikin; ji berî her tiştî, demê ku nivîskarek pêşgotinekê ji pirtûkekê re dinivîse nayê ewê wateyê ku, ew bi her tiştekî pê re ye, yan jî di evê berhemê de huneriyeke pir bilind dibîne, tiştê din ku dihêle em evan pêşgotinan binivîsin, ji evê helwesta me tê ku, em di roja îro de hewcedarî nivîsandina bi zimanê kurdî ne û divê em rê li pêş nifşên nuh vekin.

Belkî hinek, ji evan dîtin û ronîkirinên me têbighên ku, em ji berpirsyariya evê berhemê yan jî ji yên dîtir ku, me pêşgotinên wan nivîsandiye, direvin; qet na û ew ne xwesteka me ye û ne jî em ji xwediyên dîtinên tevayîne, ango dive ku, ji pirtûkekê mijarek

an helbestek bala me bikşîne, wek ku ji tevayiya gewdê keçikekê, çavên wê bihêlin buhar li dil der bibe.

Em naxwezin evê pêşgotina xwe bikin lêkolîneke rexneyî ji berhevoka "Kulxana Gundên Jibîrkirî" re, lê emê nêzîkî hinek xal û mijarên beloq bibin ku, ewana bala me kişandibû; mîna: civak û toximî, helbestvan û helwestên wî yên konevanî, dîtin û şirovekirina wî ji hinek bûyer re, hest û rewşa wî ya derûnî, bandoriya kilasîkiyên kurd û hin helbestvanên me yên dema nuh û emê li ser simbolên efsaneyî û hin xalên dîtir jî rawestin.

Piştî xwendina berhevoka "Kulxana Gundên Jibîrkirî", yek dibîne ku sê mijarên sereke bala nivîskar kişandiye û ew bûne stûnên berhevoka wî û serekiya ewan jî, civak û têkiliyên toximiyê ne, em dikarin bibêjin ku, evê babetê bêtirî rûpelên berhevoka wî standiye û wilo yek têdigihe ku, ev çêrokên toximî bêtirî rojên temenê me distîne, lê weke ku nivîskar evê rastiyê di piş hevok û çavên dilbera xwe de vedişêre, civak jî ewan çêrokan di piş nimêj, sinc û perwerdiyeke derewîn de vedişêre.

Û ne ji lêvên şil
û hunerên meyê be
ma hesp
ê di rewaniya xwe de
berdewam be??? (R. 24)

Mijara din ku, ne tenê bala nivîskarê evê berhevokê kişandiye, lê ewê hêştiye ku, bêtirî êş û kulên civaka kurd jê bêtin kişandin û wilo bi sedan raperîn û serhildan li darkevin û bi xwîna keç û xortên evî miletî jî, hezarê rûpelan bêtin nivîsandin û te mecbûr bikin ku, tu kesekî siyasetmedar bî.

Ez im tîpa yekê
Ji elfebêya xemgîniyê
Qêrîna yekê
Ji serhildana Efrînê (R. 40)

Babeta sêyemîn ku, helbestvanê me, berhema xwe li ser ristiye, bi rewşa wî ya derûnî ve girêdayiye û xwendevanê berhema wî têdigihe ku, ew bi tenatiyê hest dibe û ne tenê xwe dûrî sinc û gerdişa civaka xwe dibîne, lê pirî caran dixweze li dijî wan derkeve û gava dibîne ku, ew şer ne di ewê sivikbûn û hêsaniyê de ye, ew careke din direve kûraniya hest û pelên xwe yên sipî, da ku, kela xwe li ewê meydanê birjîne. Û wilo her û her ew xwe di meydanê de bi tenê dibîne, tevî ewqas deng û keçên ku, li derdora wî digerin.

Gava tu
di ber deriyê kamên min re
diçû
bi kevirên şekirxenda xwe
te davête pencera dilê min
qircira min
di bêdengiya gerdûnê de
lal dima (R. 25)

---
rûpela dawiyê
ji pirtûka şaristaniya min
dişewite
hevoka yekê
ji pêşgotina çêroka evînê,
riswabûne. (R. 41)

Ev ji aliyê naverok û mijarên ku, Temoz ŞEMALÎ di hundir berhevoka xwe de hembêz kirine ve, hema ji aliyê şêwe û rêbaza nivîsandinê ve, em dikarin bibêjin ku ew hîne di navbera herdu şêweyên nivîsandinê, yên sereke de diheje, ango carina tu dibînî ew helbesta xwe serbest berdide, lê di helbesteke dîtir de yan jî di eynî ewê helbestê de, ew vedigere kilasîkiya nivîsandinê û bi karanîna şêweya vekêş û rêzbendiyê, û ev yeka bi xwe nîşana destpêka guhartina civakê ye ku, lingekî wê di duh û sinc û gerdişên kevneperestiyê de ye û lingê din jî xistiye siba û bidetxistina hin sincên nuh.

Ji bilî evan du şêweyên sereke, ewî hin caran şêweya stiranên gelêrî jî bi karaniye û helbesta xwe xistiye bin akama wê de û carina jî şêweyê Şêrgo BÊKES bi karaniye û weke wî helbesta wênegirafî nivîsandiye.

Gava bi evîneke bazdayî
dilê min
germ û serxweş dibe
gewtgewta segên sergiya
pir dibe. (R. 33)

Hin caran jî ketiye bin akama ziman û helbesta Erebî û yek hest dibe ku, ew hin caran bi zimanê Erebî fikiriye û helbesta xwe wergerandî zimanê kurdî, mîna helbesta wî ya di bin navnîşana “Niçniç” de.

Lê tevî evan xalan jî yek dikare bibêje ku, Temoz ŞEMALÎ karîbû û di pir helbestên xwe de, derkeve asteyên helbestê yên bilind û hest û ramanên xwe bi wêneyine helbestî nazik nîşanî me bide.

Dixwezim tenê tiştekî bizanim
çima pêçiyên te
di nav pêçiyên min de
xew nakin. (R. 68)

Roj baş keçê
şev baş şengê, bê pelê
kengî tu yê werî
di taximên zeviyên xewnan de
bi min re winda bibî,
kengî tu yê bi min re bî
di tenahiya şeveke avis de.(R. 69)

Helbet pir wêneyên din yên nazik hene ku, dihêlin xwendevan bi helbestvan re derkevin asteyên helbestî yên bilind, weke nimûne em dikarin vegerin evan helbestan: “Çirandina Deziyên Pilindir” û “Kûzê Bîranîna” û “Çûyîn” û “Kezî Sorê” û “Pehîzok” û helbesta bi navnîşana “Kulxana Gundê min” ku, karîbû di riya wê re wêneyeke xweşik ji

gundê xwe re bineqşîne û çêrokên gund nîşanî me bide.

Digel evan wêneyên hunerî, ewî û bi paldana ser hin sembolên efsaneyî û bi karanîna wan di hundirê hinek helbestên xwe de, karîbû bala me bikşîne ser ewê şêweyê.

bila bejna nazik
birîn nekin
çinkî dixwezim
çêroka DOMOZO û ÎNENE
bi êşekên dûriyê
sar nebe. (R. 77)

Lê mixabin carina jî; ji huneriya helbestê bi dûr dikeve û bi nivîsandineke pexşaneyî û serast, hest û hizrên xwe tîne zimên û di nirîna me de, ev yeka jî, ji du sedeman hatiye; sedema pêşîn, ji lezbûna nivîsandin û çapkirina berhemeke nuh tête û sedema dîtir jî, guhdana wî ya bi hûrtirîn bûyeran û nemaze di meseleya konevaniyê de.

Li dawiyê ma ku, em bibêjin helbestvanê me Temoz ŞEMALÎ ji gundê Kefirsefrê ye û ewî di sala 1973 an de cara pêşîn çavên xwe li ser darên merxên Çiyayê Şêx Mihemed vekirin û hînê jî, ji dîtina wan têr nebûye û her sibeyê piyana qehwa xwe datîne pêş xwe û ramûsanekê ji wan re dişîne û ev berhema wî ya duduwaye û ya pêşî jî helbest bû û ew bi navnîşana "Hêviya Pirpirîkan" e û di sala 2003 an de hatiye weşandin û ... ew hînê li ser evê riyê hêviyan diçîne.

Pîr RUSTEM
Cindirês-2005

Diyarî:

Dîsa ji xanima şevê re
(CANÊ)

Ba

Guvguva bayekî tenik
xwe li tenahiya min
pêça
bi hev re
geşt û seyran kirin
geh li jor
geh li jêr,
bişkovên fediyê
ji ser rûyê
ewrekî avis
bi torîn û harbûna xwe
hilqopirandin .
Tazî bi bapêçê re
şerdikir
germ bû
sar bû
ta xwîn
di tamaran re
bi lez geriya .
Siwarê şevê

serî berve jor hildida
çivîkên dengxweş jî ,

ji dila difirîn
û ezman
li ber çavan dilotikî ,
netewitê
bi niçûnaleke bilind re
şeva tarî ronîkir ,
ba ji gewdê min
weşî .
Ji nûve
ji xûdana xûlyana
ba bihevket
û ewrekî buharê peydakir;
ji lêvan
berve jêr diçû
di ser pêşîr
zik
û baxçê evînê re
derbas bû
bidûr ket
winda bû
ba , bapêç û ewrekî tenik .

Siwarên bextreşiyê

Ji hemî sikreterên başûra biçûk re,
Piştî 12 yê avdarê;gava partiyên me;
komcivînên bilind avadikirin .

Li vê derê
dîsa rojên hicranê
li me vedipekin
û xwediyên me pûç man e
nikarin derdên me
çareserkin,
Şepirzeya kolana
û reqreqa pencera li kolanên EFRÎNÊ
wek : Ewrên buharê
dengvedidin .
Dem berve dawiya şevê diçe,
serokên me
li komcivîna bilind
dereng man e
û keştiyên xewnên azadiyê
li perava gemgeha wan
bi çavên ziwa
riya hatina wan dipên.

Meh û pir sal
ji temena ewrên avis
diliklikîn
diqeşîn,
û wan qêmiş
peyala xwekenînê nedikirin
ne jî , qêmiş daniştokên çirûk dikirin .
Ewir sar bûn
stêr hilatin
textên keştiyên hêviyan
rizîn
û ew nehatin
nehatin .

Niçniç

Tenişta evînê
Şimîtok e
mîna : Gulstêrkê(1)
di tariya bedewtiyê de
bê helwela(2)
diçirise,
Bizerava(3)eşkera harîtiyê
hevsonda elendêye
çelta(4)beleteya memikan jî
bê serane ye,
kemxa(5)cobela şermînê
dêxe
Gava çîçeka ewleyê (6)
bîn dike .
Ganeka
di hunava lerzokiyê de
nêvgonê(7)şepal dike
perûka(8)tenê nazik
gava li hevkirina
nikil – nikîna(9)du cana
di bin sehwa(10)niwaztinê de
dîlmenda niçniçê ye(11).
Rewêştina (12)

li paytexta qîta

Badeya xweşiyê ye .
Ka bipirsim
pirsa sed salan ji lêva
gelo: Seza(13)me ?
guhdarî
niçûnalên te kim,
ta ku bi hev re
bi kenara girîzê gînin .
Vezele(14)bi şahî , carekê
di baweşa xunava berbangê de
û di ser piyê çepê re
miziçandî(15) li min mêze ke,
çawa hespê derabet(16)
di şêpa(17)çiyayî de
derbest(18)winda dikim
û baraneke
germik û zelal
li rûpîva gewdê nazik
dibarînim.

.....

.1- Gulstêrk :gava stêr têxar 2-Helwela :du dilî
3- Bizerav:wêrekbûn 4-çelta:teşqelî 5-kemx:kirasê xewê yê hevirşimî6-ewleyê : bawerî ,7- nêvgon : hevpeyvîna cinsî … 8-perûk : tiştikî pir biha 9- Nikil-nikîn:Nêr û mê 10-Sehw:hêz , 11-niçniç :navnîşana helbestê ye: ahînên hêdî gava pêkanîna cinsî -12-rewêştin : nexiş , 13-seza : layîq , 14-vezelîn : dirêjkirin 15- Miziçandî:rû li ken ,16-derabet : bi hêz 17- şêp:geliyê di navbera du çiya de 18derbest : gişkî

Govenda maçan

Pêwîste ku te bibînim
çawa be
kengî be
li kû be
ne xeme,
dixwazim
birînên dema çûyî
bi vîqvîqa kenê te
sar bikim ,
hêstirên çavên xwe
bi sê rengên pişta çavên te
vemalêşim .
Pereslêrkên sîngsor
her sal
di quncikên eywana me de
çêlikên xwe
bi firê dixistin,
wisa jî ,ez
di qunçikên baweşa te de

xemên xwe bişewtînim
û têra xwe ,tê de
xwe vegevzînim .
Pêwîste ku te bibînim
çawa be
kengî be
li kû be
ne xeme
ku di siya lêvên te de
govenda maçan
bigerînim
û li ser herdû girên keçaniya te
agirê azadiya xwe
vêxînim .

Stirana şeva ker

Nizanim ez kî me
ne jî , li kîjan welatî dijîm ;
roja zayîna xwe
min şaş kirî
tenê baweriya evînekê
dihêle kêfxweş bipirsim :
Wê çi bibe
ger padşehê meraqiya te
bi lîskên girgîn
ji zîndanê rizgar kî ,
porê xwe
weke:Dînan
li welatê zikê min
belav kî .
Wê çi bibe
ger bi germiya êşxweşiyên xwe
ewrên payîzê
giş bi baran kî
û bi dînbûna livên min re
tena nazik

di baxçeyê girîzê re
derbas kî ,
seriyê xwe
deynî ser sîngê min
û dil
bi xewnên bûkaniyê
şa kî .
Wê çi bibe
ger tuwana(1) belqitandina(2) min
li quncikên şûnwarên xwe
vehesînî ,
û hespê kumêt
li pirêzeya xweşiyên xwe
ratewlînî .
Ma ne ji dengê bilbilê be
rengên wê hêjayî çine ,
ger ne ji bilindiya
ciyayê Rewandozê be
ma sûlava wê
hêjayî çiye ?

. . . . . .

1-Tuwana:kanebûn:hêz 2-Belqitandin:dilxwastinê cinsî
(heyec cinsî)

Cejna evînê

Gava min gulek sor
jêdikir
digiriya,
lê gava min diyarî
dilbera xwe dikir
poşmam bû
 û keniya .

Dilniya

Min ji te dizî
di şeveke dereng de .
Min ji te dizî
di taştiya rojeke buharê de
û rûkeniya te
bahozeke derberz
di xodresta (1) min de
gerand .
Ji wê çaxê ve
Mendala (2) rewşena te
û torahata jînê
min naskirin .
Min ji te dizî
û kotala (3) bergên dilxwaziyan
rengîn bûn.
Bi lîskên xwe
min û te bê herahera
fîstanê kurmanciyê
ji pêşerojê re
didirûtin ,
wê hingê
ji ba û basurên berbangê

xemên me
laterîk(4) bûn
lê xewnên me
li pêça serxweşiya evînê
di siya dara porê te de
dilniya bûn .
Min ji te dizî
tîrek ji astema (5) bedewtiyê
pileyek ji şêwaziya te
tayek ji lawaza(6)hunavên te .
Min ji te dizî
Perdeyek ji hezar perdeyên fediyê .

……

1-xodresta : xwe gandiye di her warekî de , 2- mendal : zaro ,
3- kotal : qumaş ,4-laterîk:cidakirin 5-astem : sîber ,6-lawaz:qels

Şeveke kembaw

Ger ne ji barana zivistanê be
kulîlkên buharê
rûgeş nabin .

Ger ne ji
tarîtiya şevê be
bedewtiya heyvê
xûya nabe .

Ger ne ji
niçûnalên çivîka be
elenda ganekê xweş nabe ,
ne ji lêvên şil
û hunerên meyê be
ma hesp
ê di rewaniya xwe de
berdewam be ????

Wêneyek bê reng

Gava tu
di ber deriyê kamên(1) min re
diçû
bi kevirên şekerxenda xwe
te davête pencera dilê min,
qircira min
di bêdengiya gerdûnê de
lal dima ,
wê hîngê
diya dilso
-bi hêvî bû-
li cobela hewşê
di bîrvaçûnê de
toza bîranînên
du birayên min ên şehîd
di biniyê fîncana qehwê de
komî ser hev dikirin .

……
1-kam:dilxwaziyên zayendî(cinsî):şehewat

Sê keval serxweşiya min

-T-
Heyv û ro
carna bi hev re
hitên
lê ti carî
serokên me
li hev neten.

-E-
Careke din
Qamişlo,kobanî û Efrînê
hevdû radimûsin,
serokên me
disa hevdû difroşin.

-M-
Partiyên me
bi xwîna xwe
xwe tev hev dikin
serokên me jî,
bi ezeziyên xwe
wan ji hevdû dikin.

Ez qehbeke Efrînê me

Vaye bi navhev dikevin
pirî pir reng
bi perikê hunermendekî
kevaleke çewt .
Rûmet mest û bê rê maye
li ser zimanê zana
dixwazim
win xweş bipîvin
van peyvan :
Ez qehbeke Efrînê me
şerbetlêv , çav kew
û rû pehn im ,
memikbel , newqzirav
û kemaxkevroşk im ,
qîtmermer
bejin zirav û dirêj im
tim ganek û agir dijwar im ,
li her derê,
li jor
li jêr
li çep û rast
ciwana xweş dicivînim,

maçek ji lêvên min :
Xemên wan direvîne.
Geh vedixim ava zemzemê
geh hejmara peyala wiskî
ji bîr dikim.
Her şevekê
di baweşa serxweşekî de
di baweşa berpirsyarekî de
di baweşa pêşrewekî de
niçîr im.
Erê qehbeke Efrînê me
tenê xweşiyê difroşim .
Ji beramber kirinê re
ne pir dilşad im
lê pêwîste ku
kûzê rengan em bişkînin
û rengên jînê
jev cudakin .
Na ne mamosteme
bi mamostakê re
xwe ji bîrnakim,
şagirtên xwe
li kolana winda nakim ,
ne jî , konevanekî navdar im
heyeseya hevala xwe

di tariya riya de
windanakim,
bi nejadên dijmin re
vîqirtiyê nakim,
li qada cengê
bi revê razî nabim .
Erê qehbeke Efrînê me
tenê xweşiyê difroşim
na ne parêzer û dadvan im
stubariya netewî ji bîr nakim
bi çend zêran
wijdanê xwe liba nakim,
na ne beg im
keçên xwe
li ahengan nafroşim
xêra belengaza nadizim
jina xwe ji xelkê re
serî bernadim
û di siya memikên melaqan de
xew nakim .
Ne jî meleyê rî dirêj im
li ser sifra ne weke şêr im
li mizgeftê bi mêranî naqêrim,
sinciya zarzêça xwe jî
bê rengî nahêlim .
Erê qehbeke Efrînê me

tenê xweşiyê difroşim
na,ne xwendevanekî
li danişтoka pêş im
û bi zimanê xwe
navê xwe nizanim birêsim,
bi sedan hevalên min
di girtîgehê de
nizanim ji bo çî dêşin .
Erê qehbeke Efrînê me
tenê xweşiyê difroşim
ka em sekin
kê ji bihna min bîn nekirî?
ka kinçên pakrewanên we
em tevdin
çendî bihna
guvaşa xweşiyên min
hînê jê tên.
Erê qehbeke Efrînê me
tenê xweşiyê difroşim
û gelek sipas ji xweda re
ger ez ne torevan im .

Du caran

Du caran dimirim;
carekê
dema li welatê min
şerê birakujiyê
vêkeve
û carekê
dema şanzdehî şibatê
tê bîra min .
Du caran jî , vedijim;
carekê
dema leşkerên dijmin
ji pêşa pêşmergên me
direvin
û carekê
dema şagirtên dibistanê dibînin
bi zimanê dê
dixwînin .

Wek sega

Gava bi evîneke bazdayî
dilê min
germ û serxweş dibe,
gewtgewta segên sergiya
pir dibe .

Derengiya şevê

Gava xewnên te
nêzîkî qelabenda(1)dilniya dibin,
li pesarê kêfxweşiyên te
konê hêviyên xwe
vedigrim,
û aşkere
ber ve serbazgeha bayîbûna(2) te têm .
Erê ne daxwaza ramana te bû ,
ne jî , daxwaza ramana min bû
ku tiştên te ên nêr
û tiştên min ên mê
li ber dîwarê şevê
li hev siwar bin ,
lê ew daxwaza hêmeniya şevê bû
ku guhdarî
zîrkzîrka textê xweşiyê ke
an guhdarî mozîka Monemor ke .
Erê ne daxwaza min bû
ne jî daxwaza te bû
lê daxwaza derengiya şevê bû .

……

1-qelabend:zîndan 2-bayîbûn:ew kesê xwe mezin dibîne

Çirandina
deziyên pilindir

Ji axa bin lingên min
lalaveke
bi hêrs derbû,
bi sîpêlên wê ên har re
penaberî komara tenahiyê bûm .
Dîsa
têlên deyana(1) min
zingarî man;
mîna : Marekî tevizî
di sermaya çele de ,
tu jî , paytexta
hevdîtin û hêviyên xwe
wek : Neyron(2) meşewtîne .
zanim jiyan bi te re
seyran e
û zanim buhar carekê
li salê mîvandar e ,
ji bo çî
di çavên zêtûnî de

hêstir kom bûne?
Bo çî şepirze û axîna
dikî wargeha min û xwe?
Ma çiqas car
me bi hev re
gelewêj dipa?!
Ma qey min bi tenê
perçemok rûçuqandibûn ?
Ma daxwaza min tenê bû
kembax kirina dîwarên şevê
û çirandina deziyên pilindir .
Çiqas
ji lêxistina deriyên nuh
hezdikî ? !
Te gulên buhara min
çelmisandin
pirtir jî ,
rakişandin
lê heroj ew
bi nûjeniya min û royê re
dê vepengizin .

…….
1-deyan:ser hişkî
2-Neyron:Îmbiratorekî Romanî bû bajarê Roma şewitand

Peyala şahiyê

Ferhenga evînê
çêrokên me hembêz dikirin,
roja
seyrana dila
xemên salan direvin,
hemû paytextên gerdûnê
di canê min î nazik de
diçurusin
hildiperin
û peyala şahiyê dadigirin
vedixwin
dişkînin .
Du hezar salin
qeşayê em dorpêç kirine ,
lê dema em digiştin hev;
evîn
dibû bagereke ji êgir
em rizgar dikirin.

Tîpa yekê

Mizgîn:Ew şagirta dibistanê bû,di serhildana
12 yê avdarê de ŞEHÎD bû .

Dîsa serê xwe
ji gola şermiyê
radikim
û li meydana çarçira
nirînên min
bi çemê dîrokê re
diherikin .
Li kolan û şikeftên
dêrsimê
bi dêrsimî re
dimeşim
dikenim
digrîm,
û cilên xwe
ji toza xopaniyê
dadiweşînim .
Bi nemir Berzan re
li başûr
li bakur
li rojhilat û rojava

((Gava hêstirên ezmên
dadirvin ser birînên me))
li kilîta şahiyên zarokan
digerim .
Ji goka zemînê
wek alafa bejna xwekuştiyan
direvim
û derbasî Îmralî dibim
gel Ocelanî
şevpestên wî
ji dema qehbe re
dijmêrim .
Ez im xetîra azadiyê
sembola mirovahiyê,
Ez im arayişta keça
rextê li milê xorta,
Ez im tîpa yekê
ji alfabêya xemgîniyê
qêrîna yekê
ji serhildana EFR**Î**N**Ê**
Ez im şagirta dibistanê
Mizgîn im
Mizgîn im
Mizgîn im .

Nûjeniya lafawa nûh

Rûpela dawiyê
ji pirtûka şaristaniya min
dişewite,
hevoka yekê
ji pêşgotina çêroka evînê
riswabûne .
Li binî kîjan darê rûnî
dara zêtûnê , merxê · · ·
di têgihîştinên gelê min de
şerm e,
kîjan rengan li xwe kî
şerm e,
endamê kîjan partî bî
şerm e,
nivîskarê hizir û hestên xwe bî
şerm e,
kîjan rojê bikenî , bigirî , bigerî
şerm e , şerm e
tifî
li têgihîştnên va dema qehbe,

li hemî riyên
çûyîn û hatinê,
li heyv û royê
tif î î î · · · · î
li diho , li îro û siba
li zemînê , li ezmên
ka hemî bi min re
tûkin,
belkim berfa sîpanê giş
bi germbûna helçûnên me re
bipişive
û lafawa NÛH ji nûve
bigere
û cûreke mirovahîyê nûjen
dest pêbike
tif î î
li pandanê min,
vaye ji we re
şikandina wî jî ;
da careke din
wisa nenivîsim .

partiyekî nuh

Endamê partiyekî dîmiqrat im
ji du hezar sal ve
şerê têwirên(1) çirya dikim,
bi hilhata keskesorê re
li welatê min
partiya min dibe keçikek
di nav qîtên wê de
gencîneyek(2)
bi çar zîncîra kilît kiriye
lê şeva bûkaniya wê
deziyên pilindir
berê çiryabûn,
û dimîne pirseke lidarxistî
çawa ?
kengî ?
li kû ?
kê ?
bersiv timî
nizanim , nizanim , nizanim .

……

1-têwir:batek:adat 2-gencîne:xezîne

Padşehê evînê

Evîn
dîsa baskên xwe
bi ser giyana min de
berdide
û di hunava sarbûna
şevên payîzê de
wek:Heyvê
biliiiiiiind difire .
Di xewneke serberdayî de
li rewrewka ciwantiya te
digerim .
Evîn
dibe sêkoşeya BERMODE
hênik - hênik
belqitandina veşarê min
dadiqirtîne .
Stubariya çûyînê diçurusî
û ji nişka ve
di bin pelandina pêçiyên nazik de
canê min niçûnal e,
gava bê jimar
bi lêvên xwe tenik

li ser ewrên lêvên min
nîgara keçaniya xwe
diçixîzand;
û di pesarê sînga min de
paldida .
Piştî fînçana qehwê
û keştiya agirê cixarê
gîşte dawiya
sîpêlên nazenaza ,
hêdî-hêdî xanima şevê ji nû ve
kincên padşehê evînê dêxistin
di hemî gir , şêp û diwêlan de
digerand ,
û di nav du stûnên nerm de
winda dikir .
Erê Ancêla dîsa te
di taxên bajarê nenasiyê de
di qiracên sînga xwe de
harîtiya min
fêrî zaraveya têrbûnê kir.
Erê Ancêla
gava te , ez vedixandim
serxweşbûna kişwera xwe
çendî kolan û kolan
di bin niwaztinên pêçiyên xwe de
min derbas kirin
ta giştim paş guhê te ,
çendî û çend qatên

avahiya tenê te
ez tê re hilkişîm
ta giştim
wezareta memikên te ,
çendî û çend sînor
di tirsa xweda de
min hilçirandin
ta giştim paytexta xweşiyên te
û di nav pelên çîçekên wê de
min xwe vedigevzand .
Erê Ancêle
çendî seyrana te
di welatê daxwazên min de
xwaş bû ,
çendî seyrana min
di gerava veşarên te de
xweş bû ,
çiqas xweş bû
gava li buhara sîngê min
bi dîsko
te navê xwe dinivîsand,
te demsal giş
pê xemilandin .
çendî kêlîkên xweş
zû direvin
û ti carî li hêvya me
ranawestin .

Gul û histirî

Gava barana buharê
rûyê zemînê
bi kulîlkên rengerengî
dixemlîne,
zîldana histiriyan vê re
 li her derê
serî hildide .

Xewrevînê

((Diyarî Ji Hesenî Ebdilhenên re))

Bibare , bibare
hêstirên dûriyê bibarin
mîna : Berfa
şibata du hezar û çaran
bi ser bejna min de
bibare,
mîna : Barana miçiqî
a dawiya gulanê
keskesor
li gundê me hildida
bibare,
ji mêj ve
çîçekên rûçikên min
tî mane;
kela hestên min
nerijiye,
ji mêj ve
bi nivîsara xwe re
bi tenê nepeyvîme
û bihna şîşeyê bînê
çinçinakê
diyarî min kirî
min bîn nekirî
bibare , bibare

hêstirên dûriyê bibarin.
Vê gavê
ramana min
li pir ciyan
weke leylanekê difire ,
carekê ramûsana yekem a……
dibîne ,
carekê jî ,
seyrana şevînê
gava çilpikên baranê
xemên li ser sîngên me dişuştin
dibîne.
û a nuha tu li kuyî ?
li kîjan bajarî ?
li kîjan welatî xemanî ?
va berbangê
ez nizam te razayî
an mîna min
fereştehên bîriyê
xew ji çavên te
revandine ?
bibare , bibare
hêstirên dûriyê bibarin.
Pênûsê min
ji hêstirên çavên te
ziwa bûye
çawa tu yê
ji nû ve tijî bikî

ta ku pê çêroka evîna me
binivîsim,
erê dizanim
wêneyên min li ba te
bi şewtandina Etrûşê(1) re
şewitîbûn
lê wêneyên te vane
li ser masa min
belavin , belaaaaaaaav bûne ,
çendî bîriya te
di hunava hewesên min de
şiqin daye,
ka pirsa dawiyê bikim
kengî baranê bibare
geliyên deşt û çiya
biherikin
û roja Alestê(2)
bigere
ji bona ez û tu
ji nû ve hev bibînin
bibare , bibare
hêstirên dûriyê bibarin
û careke din
guliyên sêvî
şil bikin .

…….

1-Etrûş:serbazgeha pkk ye li kurdistana başûr .
2-Alêsta:roja dawîya jînê ye(yewm elqîyemê).

Axaftina wîskî

Pişti mase
li dor min vala bûn ;
peyala wiskî
bi min re peyivî û got :
Bi hezaran
ên weke te
min vexwarin
lê ti kesî nikarî
ez vexwarama .

Qirçiya evînê

Demek diçû
demek dihat
kenê heyvê qirç dima,
bihna gerdîniya wisa dima
û canê min û te
dûrî hev digriyan
wê hîngê ciwana bi şev
qumrî difirandin.

Kûzê bîranîna

Bîranîn
di fediya çavên suruştê de
dimînin
û wek : Royê
li ezmanê nîgaşa merov
ronak dileyizin .
Erê tê bîra min
pêrgîna yekê
li sopêrmarkêta mazî
gava me şahî
ji pêşeroja xwe re dikirîn
û hev silava avis
bi çavên rêwiya
û rûlikeniya te .
Erê tê bîra min
ew çûnhatina
şevên havînê ên ker
û ew gêdûkên vala
li taxa gewdê te
çivîkên birçî
lê lûs bûbûn ,

bi lîskên xwejibîrkirinê
me şiyar dikirin
û mîna perçemokan
sivii·····ik sivik difirîn,
bi tîqtîqa kenê perwaz
me fereşteyên evînê
şadikirin
û hestên me
di agirê xweşiyê de
geş dibûn,
ta tarîtiya şevê
ji nav destên şevbuhêrka me
dişimitî .
Erê tê bîra min
em bi hev re
li rex zinarên Herekolê
bi birçîtiya xwe re
me bîranînên zaroktiya xwe
hewaldidan,
û pîlaxên me
di nav berfê de
tevîzî bûn ,

û di bin baskên ewran de
xilmaş dibûn .
Erê şanîkeke veşartî bûm
Mîna:Pereslêrkê
li ser gurmikê te rastê
hêlîna xwe avadikir .
Erê tê bîra min
bi awazên çirçirokên
wa şeva yekşemê re
xewnên payînê
me dixwendin
û tarîtiya şevê
direvî , direvî
û bi sibehê re
xêrnexwaza karê xwe
dikirin .
Erê tê bîra min
di balerêya xemrevînê de
me çadira xwe vegirtibû
û hêstirên mûmê
bi ser kenê me de
diherikîn , diherikîn
ta hêstira dawiyê
deng bi payvanên şevê dixistin .
Erê tê bîra min
bi tirsokbûna dilê te
ji hevsiyên xefeya te re,

tuqtuqa pêlavên min
çendî pile
di avahiya meraqiya me de
derbas dikirin ,
pêşwaziya bi ramûsaneke şêt
li piş derîkî nîvkêşî
û êxistina rûyê xwe
di moletdana(1) govdê min de
ta xitoke(2) û helmijîna(3)te
tu serxweş dihîştin.
Diwê cixara te , Xanimê
kincên fediyê
bi vexwerina qehwê re
hilçirandin
û di hênikiya kesk û sora
pişta çavên te de
di sorava lêvên te de
di dîskoya rûyê te û
bihna stûyê te de
di tenikbûna kirasê xewê de
min avjenî dikir .
Erê tê bîra min
bi zîrkzîrka textê şermrevîne re
hemî camên pencerê şikestiyan,
dîwar û ezmanê odê
hilweşîn,
balerê û kolanên bajêr binebir dibûn,

goka zemînê
çep digeriya
û parzemîn lê pir dibûn,
ro reng reşî dibû,
rêya kadizê
di nav stêran de
winda dibû
û vedenga nazikiya nalînên te
perdê guhê ŞAWÎŞKA(3)
diçirand .
Azana îkindiyê nêzîk dibû
stirana kişwera li asîmên
saz dibû.
Wek: Çilpikên xûdana eniya min
li ser sînga min
dixewva diçû .
Erê tê bîra min
hemî tişt , DILBERê .

……

1-moletdana govde;tevahî govde
2-xitoke:pê lîskandin(bi erebî dexdexa)
3-Şawîşka:xwedayê evînê bû li gel HORIYA.

Xatirxwastin

destên te yên nazik
di nav destên min de
qerimî bûn,
gava min
xatir ji te dixwast
çav di seyrana xwe de
wek : Firîna şevrevînka
sersam(1) û parparî bûn ,
kila çavên li xew
ji arayişta(2) xwe
êxistî bû,
şehkirina porê dûz
şikestî bû .
Gava min
xatir ji te dixwast
civlandina kirasê şevê
xewnên niwaztinên me
hewal dida ,
şev ji sibehê direvî
û çavên min
nikarîn xew
kedî bikirana .

……..

1-sersam:gemje(bi erebî ehmeq) 2-arayêşt:mikyac

Sozeke penî

çi bûye
îşev yara min
dereng maye ?! ! !

Çûyîn

Gundekî pir dûr ;
di sivîka (1) keçeke şeyda de
malike ne wek malan,
di qunçikê evîna wê de
findeke ji hêviyan
li benda min e ,
ku tîpên keçaniya wê
bixînim
ez dimeşim .
Li dera çûyî
gewtgewta segekî har
di xwîna min de
bilind dibû,
û li vir
xunava sibehê
li gulistana evînê
dimeye,
li dera hana jî
xumxuma geliyekî kûr

ji hunava wê tê
wek :Gava qetandina stêrkê ji ezmên ,
ez dimeşim , dimeşim.
Di şeveke tarî de
li ser riyeke çipil
ez dimeşim , dimeşim , dimeşim .

.....

1-sivîk : jêrî zik

Rewşa me

Xebat , bawerî
Baran , berf ····· û birçîtî
Şer , êşkence
û berdewamî
= = = = = = = = = =
= = = = = = = = = =
winda dibin
nûjen dibin .

Ez firotim

Berî çend rojan
berî çend salan
berî çend deman
ez hebûm li jînê zarokek
ez hebûm li jînê merovek
ez hebûm li jînê welatek,
piştî xudiyên min ;
li ser masan
li bazara kolan
bi ezeziyên xwe
ez firotim , keçikek
ji wê çaxê ve
li meyxana
kesên bi şebqe
(Roj bi Roj)
ji bo şevekê
li ser min dilîzin .

Kezî sorê

Roj baş keçê
şev baş nazikê , rindê
çawaye rewşa te ?
stêr û heyv ?
pênûs û nivîsar ?
şeva çûyî bihîstoka te
di bin hevpeyvîna me de
dilerizî
îro di baweşa suruşta buharê de
min bîra te kiriye,
gangulîkên rengerengî
dixwastin pêşwaziya
bejna te a nazik bikin,
û pinpinîkên
min ji te re dijmartin
li hêviya ku dîlanekê
ji te re bigerînin .
Hevnişîna(1) bi dengê çivîka re
di seyrana evînê de
dê çendî xweş biba,
keçê .....
lerzokiya deng

û şepirzeya derûna te
cara yekê bi bihîstokê
ji bîra min naçe,
bi tîqtîqa kenê te re
levdana dilê min
şaş dima
û şahî li min
vedigerandin ,
mi zanî ku kamraniya
di siya dareke merxê de
paldaye
bi aramiya rojan re
li hêviya me ye ,
stubariye
ji nûva kulîlkên jînê
ji pêşerojên xwe re
em biçînin
û bi guvaşa dilên pak
bi hilata royê re
yeko – yeko avdin .
Ji bona te
siloganên xwe
di girêva li zanîngeha Helebê(2) de
min digotin
û di serhildana EFRÎNÊ(2) de
pêşve diçûm .

Erê perwaziya te
di canê min hilnetê
û di nav kulîlkên
hêviyên min de
wek : Rengên keskesorê
pêêêêêêêêêlpêle.
Keçe · · · · · · ·
gava şeva hêmen
vê deng derbasî
perava xewnên min dibî
wê hîngê
te û fereşteha
nikarin ji hev cuda bikim .
Roj baş keçê
şev baş delalê , şekirxendê
destpêk kenekî bê gunehe
gelo dawî jî
mîna destpêkê be ?
an wê xweştir be ?
Gava hevdîtina
li orta kolana elêlat(3)
li taxa Eşrefiyê
û ramûsaneke zaroktî,
hevmeşîna
di bin barana çele de
li Siryan ,Sebîl ,û Mogembo

geh me vedigirt sîwan
û geh di taldeyî wê de
me hev maçdikir .
Keçê .....
gava giyanwerên bedxû(4)
hêrişî canê min dikin
giyanpaka te
mîna zarokekî
bê pirge min hembêz dike
û wan beredan dike,
dixwazim tenê tiştekî bizanim
çima pêçiyên te
di nav pêçiyên min de
xew nakin ,
ne jî , li ser sîngê min
melevaniyê dikin,
dixwazim
hêmeniya jîna te
a min be
û ger karibim
rengên çavên te ên kesk
ji te bidizim ,
bi dîwarê oda xwe ve
bi keval kim .
Şabûn bi baskên xwe
min difirîne

ji ber ku tu li jînê heyî ,
erê nêzîkî minî
tu li virî
di hizirên min de yî
di peyvên min de yî
di xewnên min de yî,
bikene , bi dengekî biliiiiiiiind bikene ,
bixwîne , hêêêêêdî hêdî
di çavên min de
bextiyariyê bixwîne,
bigere , li hemî bajarên govdê min
bigere
ez gelekî şame bi te.
Carna serxweş, mest û teles dibim,
Carna di bîrvaçûnê de
xwe ji bîr dikim,
û carna li nav batekên(5) çirya
windadibim.
Gava bayê rojhilat
bayê bakur
bayê , bayê · · ·
girane , bi ser min de tê
bihna bisk û keziyên sor
vê re tên .
Roj baş keçê
şev baş şengê , bê pelê

kengî tuyê werî
di taximên zeviyên xewnan de
bi min re winda bibî ,
kengî tuyê bi min re bî
di tenahiya şeveke avis de,
çunkî vêyî te
çêrok û çirûskên şevê
giş vedimirin ,
kengî bi min re
li midara hespekî bi bazik
siwar bî,
ji bona li bajarê xewnan
bi lîska pîtanokan
bîst û şeş mûman
ji şepaliya te re vêxim ,
kengî tuyê min vexwînî
gulistana hewesên xwe
ta bi fîncana qehwê re
serçeyên sibehê
em ji xew şiyar kin
û xeman ji dila
bifirînin .
Şev baş keçê
hevalê , rindê
va şevê
basurek ji dûr

ji baskên fereşteh û keçperiyan
bihevdikeve,
bi ser rûyê min de tê
û derbas dibe ,
durbeke taqan(6)
li ser çengê min
dinexşîne .
Çendî stiraneke xweş e
bê dengiya te
henekên te
hilpera te .
Roj baş xanimê
şev baş
nazikê , xiringê , çinçinakê .

.....

1-hevnişîn:rûniştin 2-di serhildana du hezar û çaran de li kurdistana sûrê. 3-elêlat:zehmê 4-bedxû:ne rind
5-batek:têwir:adet 6-durbeke taqan:neqşeke başqe

Stewirbûna lîskên te

Piştî hevala min , li ser çend werîsan canbaziya
Xwe bikar dihanî û weke pîrgawîskan xwe pir
rengî dikir û pirtirî carekê min lome jê kir ,
lê ji berdewamiya şaştiyên xwe nedima ·

Ji te pengirîme
bese , bese , bese
naxwazim navê te bibhîzim ,
ne li ser zimanê xwe
bigerînim ,
ne jî , axa ku tu rojekê
li ser meşiye
ez pêlêkim,
te agir rête
jiyana min
jehir xiste
cegera şahiyê min
bese , bese.
Erê te xwe ji min re
Kiribû hemî tişt
ba , av , ax , û agir ,
te xwe kiribû arama hebûna min

zengilên kenê min
hêviya sîpetiya min .
Lê nuha
ta ew tîpên navê te
ji nav Elêfbaya helbestên xwe
min rakirin .
Xwazîka
li lengergeha sozên te
keştiya peyatiya xwe
girênedaba ,
xwazîka
min dilê xwe bişewtanda
berî min ji te re
vedikir,
te zor bohênan(1) dikim
zor bohênan dikim
ey erzana va jînê
riswaya hebûnê ,
ma ne bese , ne bese
hey biçûkê ·

. . . . . .

1-bohênan: jê xeyidî ye

Nandoziya sega

JI HEMÎ KESÊN KU WEKE……..

Gava hilab
ji şikefta tarîtiyê
serî hildide;
segên gunda
pêda direwin,
lê hilab her diçe
bilind û rengîn dibe .

Ro û heyv
û keçeke bedew

Ji mêj ve
bedew û bilindiya te
min diye ;
ji roja kenê te
hestên min hejandine ve ,
ji wê çaxê ve
xewneke kal (1)
di şîlava (2) şeveke bî de
tajana dide xwe,
û di hêviyên nûgiha de
bi mija sibehê re
belaaaaaaav dibe .
Ji mêj ve
di bihna kulilkên
ku pelên wê
bi xunava gulanê
hatine şuştin,
û di siya ewrekî tarvara de

ez li keçekê , ku ji bîranînan
xwe rizgar kirî ;
pênûs û rûpelekî sipî
ji çavên felekê wergirtine
digerim .
Bi dengê pirçepirça (3)
dîwarên fediyê re
min baskên xwe
li perdeyên nazikiya te
dixistin ,
û reşeba min
ji hevdîtina çûyî ve
bi xûlyana çurûsa çavên te re
dildanewe (4).
Erê îşev
daxwaz û mêrantiya min
di hêmeniya serxweşiya te de
xwe vedigevzînin .
Erê îşev
siwarê harîtiya te me .

Erê îşev
te careke din
şiroş (5) û Akadadka(6)
li şûn ewrên buharê
dihiştin ,
lîsk û pêmahiya kenê xwe
li zozanên bîriya min
verşandî dihiştin
û hezar şûşeyê bînê
li taximên sînga geş
min şikandin ;
hajêkê
cînciqên wan
bila bejna nazik
birîn nekin,
çunkî dixwazim
çêroka DOMOZO û **Î**NENE
bi êşekên dûriyê
sar nebe ·
Ew çirçirokên şevê
li ser dengê
serçeyên sibehê
xwe mezin nekin .
Bila qircira bêdengiyê
bajarê sozan
kembax nehêle

û li nav pêmahiya
kavilekî kêrça de
li hêmanên şahiyan
em negerin .
Erê piştî min Akadadka şewitand
tu nabê
çiqas xweşî hene
li piş sînorên lêvgulên te
xwe veşartine ,
ji wê çaxa jibîrvaçûme de
xewnên min
bi tena xwe
aza dikenîn .

.....

1-kal : ne gîştî : ne bûyî , 2- şîlav : malkê zaro ,
3- pirçepirç : · · · · · · ? 4 – dildanew : aramanîn ,
5- siroş : mizgîniya alesta dike 6- akadadka :
dadgeha xudêyî ,

Bihna xweşiya te

Carekê
bi gulekê re peyivîm :
Tu tevde çend pelî
lê ev bihna xweş
giş ji ku der te tê .

Keçeke biyan

Û şevê tu jî ,
weke şevên çûne
ji nav destên min
diherikî
û bîranîna
li ser baskên mandê
diçînî,
vêre tîpên evîneke kal
pokanew (1) dikî ,
dilê min
bi roniya helabê re
parparî dihêlî .
Hevpeyvîna xatirxwastinê
bi bihîstokê
bi ramûsaneke germ
ji bayê bilind
xwe digand e dawiyê .
Têgihiştinên merovahiyê
di hunavên min de
geş dikî

ta nawirên çiya
jê têr dibûn.
EMEL
ka wek zimanê xwe
yê serast
wek kenê xwe
ya ji hemî ahengan zelaltir
wek reşeba xwe
yê ji agirê cegera min germtir
bêje ,
bêje û vêyî tu
li çûyîna şevê bipirsî,
vêyî tu
li şewtandina evîneke riswa
bipirsî;
tu çi bû ?
xewn bû ?
leylan bû?
perî bû?
an weke qehbetiya
hinek partiyên me
di têgihiştinên xwe de
xizmet hezar kembonewo (2)dikî.
Te bûyûna min
şepirze kir !

jiyana min
tarvara kir ! !
Gelo ey şevê
weke pêşrewên me
winda me ?
xewn im ?
lê ez leylan im ?
EMEL
tevî ku tu
ne ji xwîna gelê minî;
tu ew stêra li ezman
bi ser gulistana dilê min de
rijiya yî.
Tê bîra min
gava goftegoya yekê
min digot : Dizanim evîna me
dawiya wê
êşa bê sînor e
dojeheke li jînê ye,
erê û ji berdewamiyê
em nediman.
Here şeva payîzê here
ti carî wek me
di terbûna(3)dilê xwe de
li çûyînê nepoşmam be,

here şevê
û zanibe
ti pelan ji dara şahiyên te
jênakim
çinkî ez qêmîs nakim
ew roniya ji riwê ezmana tê .

.....

1- pokanew : bin ax : siyan ,
2- kembonewo : hevdujî , 3 - terbûn : ne hişk ,

Domdariya xeman

Carna
ta şev di şevê de
radikeve,
lê ti carî xemên belengazan
ranakevin .

Pahîzok

Weke her car
dema te bû ?!
ku tu bi rêkevî
ji hembêza maçên xaç ,
erê agirê dila
bi agirxweziya gankirinê
te vemirandin
û berve dûçikxweşiyê
hildidan .
Pijqandina
deziyên roya sibehê
ji me ve
nêzîk dibin ,
bilindiya hilabê
li ezmanê gundê me
xelekeke fireh
ji mijmoranê çêkirî ,
çawa tu yê
ser sînga min
sêwî bihêlî

û ji ramanên şeydanî re
rê açiq bikî.
Ev pahîzokên(1)îşev
bi belqitandina xwe
te li deşta hewesên min
çandine
ez ji gerdişa penîtiyê
bi dûrxistim.
Kengî
tu yê lê vegerî ?
da ku pelên wê
ne çelmisin.
Perwa dikim ku
çilpikên baranê
di zistaneke nenas de
bi lêmişt bin
û wan binav kin ,
erê ezê şukre(2) kim
dorhêla wê
ji lêvên te re,

da vegerî
welatê xweşiyên min
ji bona aşotiya keçaniya min
rizgar kî,
min li pişta
hespekî bi basik
siwarkî
di nav stêran re
min bifirînî .

.....

1- Pahîzok : çîçekê cotariya , rengê wê binefsî ye,
2- Şukre : hewş : sûre ,

Zorbayê Sibehê

Derengiya şevê
berve şifaqa sibehê
diçe ;
di demeke hawraz de
wê bi sirûdeke nûjen
bayex dikim ,
xunava hulma şewtandina YEKDA(1)
ji şevpesta demê şiyar kirim
kel û pelên min jî
belav bûyîbûn .
Tim li ber pencera
hêvîyên xwe,
li ser rûnişteka
ji parsiyên dîroka reş
rûniştî bûm ,
rengên stêrên veşartî
dipan.
Ewrekî gewir , hişîn û reş
ewrekî dawiya payîzê

tamarên wî tevhev dibûn
û bi ser mala min de
dihat
((mala min:
Sê ode ne
sê bajarin
û sî pakrewan e))
wê hingê
dengê lîliya keçên AMÛD**Ê**
ji nêzîkî ramanên min dihat ,
dengê girêva zaroyên CINDIR**Ê**S**Ê**
di wijdanê min de
bilind dibû.
Guvguva zorbayekî
ji bakurî welatê min
ji rojhilat
ji başûra biçûk
ji Qamişlo
tev silavên Kobanê
li rûyê çîçekên
zêtûn û sicika Efrînê
dixist,
vê re bihneke xweş
bihneke giraa·····an
bihna KOMARA ROJEKÊ

ji şevbihna ser gora
leşkerê pasîv
dihat .
Derengiya şevê
berve şifaqa sibehê diçe
gava ji baweşa dilbera xwe
dizêvirîm;
li ser rêyeke civliq , herî û dûz
min xwe nasnedikir .
Zorbayek
kenê zarokekî
û banga sibehê
li deriyê xewnên min î sar
dixin
vêre ji mirina xwe
vedijim
û careke din
li kolanên Efrînê
pakrewanekî
li pişta xwe dikim .

.....

1- Yekda : di serhildana du hezar û çaran de , li meydana
Seedela elcebirî li bajarê helebê agir bi canê xwe xist di 27/3/2004 an de
·2-Bayex:gudan

kulxana gundê min

Bûye ew çûka
di nav ewrên nebez de
bê tîn mayî ,
di navbera çar çiyayên bê serûbin de
di xewneke navkel de
tozê ji ser dîroka navmeziniya xwe
dadiweşîne ,
bûye ew pirtûka kevnar bênavnîşan
li kêleka riya bazarganên evînê
li nav kulxana (1)demê
ba rûpelên wê
yeko – yeko diçirîne .
Gundê min
navê te her gewreye
ji navê welatê min
kevintire
rengên keskesorê lê
rengvedane .
Her yekî li gundê min
rengek li xwe kirî ,

hinek ji wan
pêşmergê welatê xwe ne
hinek girtiyê girtîgeha dijminin ,
hinek ji wan
nivîskar , sêyasmend û xwende ne
û hinek karker û cotkar in
lê hinek
şerûd, xwefiroş û altax .
Erê di gundê min de
pir tişt têra pir tiştan nakin ,
de azande Mihemedê Eynê (2)
azana sibehê , azande
bi mozîka dengê te re
her tiştek
di hunavên min de
çîçek dide ,
di ramana min de jî ,
evîn , dûrî , merovahî
dayîk , mirin , şahî
toz , berf , çûyîn , hevdîtin
torîn , gandan (3) û panpanokî (4)

ahengekê ji min re
saz dikin ,
xûyaye mayî stubariya te
ji xewrakirina xelkê
ma gelo dengê te yî xweş
wê têra menga (5)
biçûk û mezinên me bike?
çinkî meyxana gund
têra meyvexwaran nake!
ne jî , gêdûk û kolan
têra zibiq û serxweşên
îkindî û dawiya şevê dikin .
Erê quncikên hewşa mizgeftê
têra pêkanîna toximiyê nakin ,
û ne tarîtiya şevê
têra hevrevîna evîndara dike ,
ma qey xêr û bêra gund
ya pir
carekê wê
têra dêndar û sêfîltiya me bike .
Erê li gundê min
derî û pencerên wênasiyê pirin,
geh pênûsê min
geh çavên min
nişkave pê dilepirin ,
gava li taxên wî digerim,

pir rengên gankirinê
dibînim ,
li aliyekî
di navbera xoşk û bira de,
li aliyekî
di navbera bûk û apê de,
û li aliyekî
di navbera birazî û amojna xwe de .
Gava li hevalekî xwe
li gundekî din
ez dipirsim,
dibînim çawa pîreka birayê wî
xwe gandanî wî kirî .
Mixabin ezkê çi binivîsim
û çi ji demê re bihêlim
pelçimên payîzê diweşin Pirin
lê çêrokên gudê min pirtirin .
De azande , Mihemedê Eynê
bi dengê xwe yî xweş
azana sibehê , azande
xûyaye bûye stubariya te ku
deng bi serçeyên sibehê xînî ,
belkim dilovaniya dengê te
û xamava pênûsê min
rojekê alozî û nexweşiyên gund
çareserkin ,

belkim nivîsandin
rikdarîya xwe
ji serêşiya min re
ko bike .
Gundê min
destpêk û dawîya evîna min;
ma gelo geh lawaz(6)
û geh çavnetirsiyên min
wek: Tava rojê
wê karibin
tarîtiya qurzîkên veşartî
aşkere bikin ?
an wê têra
çi iiii û çi bikin ?

.....

1- kulxan : toz , 2- Mihemedê Eynê :Oldareke ji gundê helbestvane(KEFIRSEFRê)JI ber milê gund ve AZANA sibehê azan dide 3-gankirin :pêkanîna cinsî . 4-menge:benckirî 5- panpanokî : pêkanîna cinsî di navbera du kes mê de , 6-lawaz:qelsî:ze,îftî

Naverok

1. Pêşgotin ----------3
2. Diyarî ----------9
3. Ba----------10
4. Siwarên bextreşiyê -------12
5. Niçniç ----------14
6. Govenda maçan ----------17
7. Strana şeva ker ----------19

8. Cejna evînê ----------21
9. Dilniya ----------22
10. Şeveke kembaw----------24
11. Wêneyek bê reng ----------25
12. Sê keval serxweşiya min -26
13. Ez qehbeke Efrîn im ----27
14. Du caran ----------32
15. Wek sega ----------33
16. Derengiya şevê—----------34

17. Çirandina deziyên pilindir ----------35
18. Piyala şahiyê ----------38
19. Tîpa yekê ----------39
20. Nûjeniya lafawa nuh ------41
21. Partiyekî nuh --------43
22. Padşehê evînê ------44
23. Gul û histirî ----------47

24. Xewrevînê ----------
-----48
25. Axaftina wiskî -----
--------51
26. Qirçiya evînê ------
----------52
27. Kûzê bîranîna --

53
28. Xatirxwastin ----------
-----58
29. Sozeke penî -------
---------59
30. Çûyîn -----

-----60
31. Rewşa me

-----63
32. Ez firotim

-----64

33. Kezî sorê ----------65
34. Stewirbûn a lîskên te ------72
35. Nandoziya sega ----------74
36. Ro û heyv û keçeke bedew----------79
37. Bihna xweşiya te ----------79
38. Keçeke biyan ----------80
39. Domdariya xeman ----------85
40. Pahîzok ----------86

41. Zorbayê sibehê ---- -------89
42. Kulxana gundê min------ 93
43. Naverok----------98